

Welat  
01/08/2015  
23



*Efrîn û sirûda  
mayinê*

# PEYVA WELAT



## Bila ïdî bi şadî em bijîn

Aras Yûsiv

2

**D**i dîloka her mileteki de gelek hest û bîranîn kom bûne, hin ji wan bi lehengiyê şanaz in û hin jî bi destlatdariyê serbilind in, ji wan miletan gelê Kurd e, yê ku dîloka xwe ji dîrokê veguhestiye û ïdî tenê bi awayekî reşbînî bîranînan dihûne û dirêse.

Gelek sedem hene ji vê diyardê re, carnan ji bindestiyê û şikestina hêviyan, û carnan ji meşeştiyê û surgûn û kuştinê, bi vî şêweyî sitran û destanên Kurda bêpar nema ji gotina Ax Felek ê, û mînak jî : Ax û of, li minê yadê, felekê xayinê, zemanê xirab... t.d

Destladaran li gelê Kurd hemû awayên zordariyê kirin wek rûdawek rasteqîne, û belê ji azar û êşan Kurdan ew hemû xemên xwe di riya devkî û nivîskî diyar dikirin û didan pêş nifşen ku rojekê ewê werin.

Lê bêguman ïdî ew dîlok tenê ewê wek bîranînan ji me re bimîne, ji ber ku Kurd nema wek berê mane, blindest û dîlêن biyaniyan, vaya dîrok rûpelên nû dinivîse û bi rengê Buharî serkeftinên zêrîn bi cî tînin.

Îdî war ji xema re dive ku nemîne, û li şûna hêşirên biketinê gereke rundikên şadbûnê xwe bigre. Bi rizgarbûna derûna Kurdî yak u bi sedan salan hatibû binpê kirin ïdî em dikarin careke din dîlokên xwe bafirînin û ji nû ve bi şêwazek nû li jiyanê temaşe bikin.

Bila ïdî dil û hinav bi azadiyê şadbin û zarokên

Kovara WELAT  
Çandî- Giştî- Mehane



Sernîvîser:  
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:  
Xweşnav Heso  
Mihemed Zekî Mihemed

Dizayner:  
Hesen Berzencî

Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediye xwe ne û nivîskar berpîrsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:  
welatpress2014@gmail.com  
[www.facebook.com/Dengekurdistanasurya](http://www.facebook.com/Dengekurdistanasurya)

nûhatî wek nifşen berê azarê bindestiyê nekişînîn, ïdî bila tu kes nebêje Ax Felek!, ber ku viyana neviyên Mîtan di vê qonaxa awarte de wateya mayinê diyar dikin û bi gulan sînoran ava dikin li hemberî lehiyê Feleka bê bext.



تبني ثورة  
adopt a revolution

# Hezwanî .. Kevintrîn Kurdên ku Yehûdî ne:

Izedîn Salih

**H**ezwanî,ku bi navê Gelê Ediyabîn an jî Hediya bê têne naskirin,li Welatê ku di navbera herdû çeman de «Mîzopotamiya» ango ser Zemîna di navbera Çemên Dicle û Fîratê de ku hin ji Xaka Sûrî,Turkî û Îraqê jî dikeve tev wê,ji berî zayînê ve cîwar bûne.

Li Gorî Dîrokzanan ew Kevintirîn Kurd bûn ku baweriya xwe bi ola Yehûdî anîn û ew şopandin,herwiha Dîrokzan,Rojhilatnas,û Telemûdî jî diyar dikin ku bandora wan Yehûdiyêن ku bi sedema Şerê di navbera Gelê wan û Aşûriyan de li ser destê Şahê Aşûrî «Şelemenser yê Sêyem» bo Kurdistanê koçber bûbûn di navbera salên (858-824)an de B.Z û hevjiyana wan bi Kurdên Hezwanî re hişt baweriya ew beşê ji Kurdan bi ola Yehûdî çê bibe,tê zanîn ku Kurdên dê niha li Israyîlê dijîn ew Neviyêن Hezwaniyan e.

Dîrokzan û Lêkolînerê Emerîkî Kêvin Brok tekez dike ku Hezwanî weke Şahê ola Yehûdî dihatin naskirin,herwiha ew di Ramyarî û Karûbarên Leşkerî de bi nav û deng bibûn,û di sala 15an P.Z de Hezwaniyan Kişwera xwe Damezirandin û Bajarê »Hewlîr» wek Paytext ji xwe re ragihandin,û Li gorî Nexş û Destnivîsên Kevnare Sînorêن Kişwera wan ji Bakûrê Kurdistanê cihê ku Keştiya Pêxemberê Xwedê «Nûh» lê bicî bûbû ve ta Başûrê Bajarê Qudisê dirêj dikir,û Jêder dibêjin ku hinek Şahêن Hezwaniyan li wê deverê binax bûne,herwiha Şahjina Hezwanî ya ku bi navê «Hêlîn» û Lawê wê Şah «Monbaz» ji xwe re Koşek li Bajarê Qudisê ava kiribûn.

Kişwera Hezwaniyan nêzîkî Sedsalekê dirêj kir,ji Desthilata «Îzatîs» Şahê wan yê yekem



di sala 15an P.Z de ta Kuştina Şahê wan yê dawî «Mihrasbîs» ser destê Rûmaniyâ û Ketina Kişwera wan di sala 116an P.Z de.. Hêjayî Gotinê yî ku Desthilata Şahê Hezwanî «Monbaz» Lawê Şahjin «Hêlîn» bîst salan dirêj kir,û ew di sala 58an P.Z de jiyan xwe ji dest da û 24 Zarok li pey xwe hiştin,û li Bajarê Qudisê jî hat binax kirin.

Jêder:

- 1– The Assyrian & Babylonian Exiles.
- 2– Adiabene, Jewish Kingdom of Mesopotamia, (c), 2000 Jonah Gabriel Lissner. B. A All Right Reserved.
- 3– Arran Province (New Republic of Azerbaijan). By: C. E. Bosworth.
- 4– A Chronology of World Political History C. E. ([www.goecities.com/kfzhouy/1000-801](http://www.goecities.com/kfzhouy/1000-801)) ,Chron/Chron5e.html. ■

## Xaniyekî xortinan, gundekî mirovinan

- للجمع المجهول (pirjimar): نضيف اللاحقة (-ine) إذا كان الحرف الأخير ساكنًا أو (-ne) إذا كان الحرف الأخير صوتيًا إلى الاسم الأول، مثل:

Hespine beza, maline xweşik, xanîne fireh

- نضيف اللاحقة (-ê) للاسم الثاني إذا كان مؤنثًا معلومًا:

Hespine Şêrînê, ewrin baranê

- أو نضيف اللاحقة (-ekê) للاسم الثاني إذا مؤنثًا مجهولاً:

Xanîne jinekê, hêkine mirîşkekê

- نضيف اللاحقة (-ekî) للاسم الثاني إذا كان مذكراً

沐لوماً:

Xanîne mîrekî, ciyane welitekî, bizinîne gunedekî

- نضيف اللاحقة (-an-) للاسم الثاني إذا كان جمعاً معلوماً:

xanîne xortan, hespine xortan

- نضيف اللاحقة (-inan-) للاسم الثاني إذا كان جمعاً

مجهولاً:

xanîne xortinan, hêkine mirîşkinan

- للمفرد المذكر المجهول (yekhejmara nêrza): نضيف اللاحقة (-ekî-) إلى الاسم الأول، مثل:

Hespekî beza, nanekî sêlê, karekî giran, dilekî evîndar

- ونضيف اللاحقة (-ê) للاسم الثاني إذا كان مؤنثًا معلوماً:

Hespekî Şêrînê, erwekî baranê

- أو نضيف اللاحقة (-ekê) للاسم الثاني إذا مؤنثًا مجهولاً:

xaniyekî jinekê, nikilekî mirîşkekê

- أو نضيف اللاحقة (-ekî) للاسم الثاني إذا مذكراً مجهولاً:

Xaniyekî mîrekî, deriyekî xaniyekî

- نضيف اللاحقة (-an-) للاسم الثاني إذا كان جمعاً معلوماً:

Xaniyekî xortan, derdekkî dilan

- نضيف اللاحقة (-inan-) للاسم الثاني إذا كان جمعاً مجهولاً:

## مراجعة حالات الإضافة:

4

الاسم الثاني						الاسم الأول
الجمع المجهول	مؤنث مجهول	مذكر مجهول	الجمع المعلوم	مؤنث معلوم	مذكر معلوم	
Hespê xortinan	Hespê keçekê	Hespê xortekî	Hespê xortan	Hespê Helezê	Hespê Aram	المذكر
Mehîna xortinan	Mehîna keçekê	Mehîna keçekê	Mehîna xortan	Mehîna Helezê	mehîna Aram	المؤنث
Hespêñ xortinan	Hespêñ keçekê	Hespêñ xortekî	Hespêñ xortan	Hespêñ Helezê	Hespêñ Aram	الجمع
Hespekî xortinan	Hespekî keçekê	Hespekî xortekî	Hespekî xortan	Hespekî Helezê	Hespekî Aram	المذكر
Mehîneke xortinan	Mehîneke keçekê	Mehîneke keçekê	Mehîneke xortan	Mehîneke Helezê	Mehîneke Aram	المؤنث
Hespine xortinan	Hespine keçekê	Hespine xortekî	Hespine xortan	Hespine Helezê	Hespine Aram	الجمع

Xaniyê mîrekî, goştê dîkekî

نصيف اللاحقة (-an) للاسم الثاني إذا كان جمعاً معلوماً:

xaniyê xortan, kerwan

نصيف اللاحقة (-inan-) للاسم الثاني إذا كان جمعاً

مجهولاً:

xaniyê xortinan, deriyê malinan

للجمع المعلوم (pirjimar): نصيف اللاحقة (-êن) إلى  
الاسم الأول، مثل:

-٣

Kerên gund, malên welatiyan

نصيف اللاحقة (-ê) للاسم الثاني إذا كان مؤنثاً معلوماً:

Hespên Şêrînê, ewrêن baranê

أو نصيف اللاحقة (-ekê) للاسم الثاني إذا مؤنثاً مجهولاً:

Xaniyêن jinekê, hêkêن mirîşkekê

نصيف اللاحقة (-ekî-) للاسم الثاني إذا كان مذكراً معلوماً:

Xaniyêن mîrekî, çiyayêن welatekî

نصيف اللاحقة (-an-) للاسم الثاني إذا كان جمعاً معلوماً:

Malên xortan, xewnen şevan

نصيف اللاحقة (-inan-) للاسم الثاني إذا كان جمعاً

مجهولاً:

Malên xortinan, hêkêن mirîşkinan

الإضافة في حالة المجهول (Zêdera nependî):

وتنتمي هذه الإضافة كما يلي:

1- للمفرد المؤنث المجهول (yekhejmara mîza) إلى الاسم الأول، مثل:

نصيف اللاحقة (-eke-) (yekhejmara mîza)

Sêveke sor, keçeveke jîr, dayikeke rind, dareke mezin

أما بالنسبة للاسم الثاني:

- نصيف اللاحقة (-ê) للاسم الثاني إذا كان مؤنثاً معلوماً:

Maleke Şêrînê, pirtûkeke zanînê

- أو نصيف اللاحقة (-ekê) للاسم الثاني إذا كان مؤنثاً مجهولاً:

Maleke jinekê, hêkeke mirîşkekê

- نصيف اللاحقة (-ekî-) للاسم الثاني إذا كان مذكراً معلوماً:

Maleke mîrekî, odehyeke xaniyekî

- نصيف اللاحقة (-an-) للاسم الثاني إذا كان جمعاً معلوماً:

Maleke xortan, evîneke dilan

- نصيف اللاحقة (-inan-) للاسم الثاني إذا كان جمعاً مجهولاً:

Maleke xortinan, hêkeke mirîşkinan

## زاوية القواعد الـكـردـية

### الإضافة

#### شـيرـكـوهـ مشـكـينـي

هي إضافة كلمة إلى كلمة أخرى (اسم واسم، اسم وصفة، اسم وضمير،  
هي اسم وظرف) بهدف توضيح المعنى وربط الكلمتين وبيان صفة معينة  
في الاسم الأول، كقولنا: (gula zer) ويتم ذلك بإضافة لاحقة (paşgir)  
على الاسم الأول، حسب التالي:

الإضافة في حالة المعلوم (Zêdera pendî):

والمعنى هو كل كلمة نعرفها عند التكلم عنها، وتنتمي هذه الإضافة كما يلي:

1- للمفرد المؤنث المعلوم (yekhejmara mîza): نصيف اللاحقة  
(a-) إلى الاسم الأول، مثل:

Sêva sor, keça gundan, dayika min, dara gûzê

أما بالنسبة للاسم الثاني:

نصيف اللاحقة (-ê) للاسم الثاني إذا كان مؤنثاً معلوماً:

Mala Şêrînê, pêşıya malê

نصيف اللاحقة (-ekê-) للاسم الثاني إذا مؤنثاً مجهولاً:

Mala jinekê, hêka mirîşkekê

نصيف اللاحقة (-ekî-) للاسم الثاني إذا كان مذكراً معلوماً:

Mala mîrekî, evîna dilekî

نصيف اللاحقة (-an-) للاسم الثاني إذا كان جمعاً معلوماً:

Mala xortan, evîna dilan

نصيف اللاحقة (-inan-) للاسم الثاني إذا كان جمعاً مجهولاً:

Mala xortinan, hêka mirîşkinan

2- للمفرد المذكر المعلوم (yekhejmara nêrza): نصيف اللاحقة  
(ê-) إلى الاسم الأول، مثل:

Hespê beza, nanê sêlê, karê giran, agirê Ne-wrozê

ونصيف اللاحقة (-ê) للاسم الثاني إذا كان مؤنثاً معلوماً:

Hespê Şêrînê, erwê baranê

أو نصيف اللاحقة (-ekê) للاسم الثاني إذا مؤنثاً مجهولاً:

xaniyê jinekê, goştê bizinekê

أو نصيف اللاحقة (-ekî-) للاسم الثاني إذا مذكراً مجهولاً:



زانة عمر لـ ولات :

- \*أشعر بالرضا كوني أعيش في هذا التوقيت من التاريخ..
- \*المقاتل المبتسם دائمًا، قمة علاقة إنسانية تربطك به..
- \*نحن نعيش في مرحلة انتقالية تتسم بسقوط مفاهيم قديمة وبناءً مفاهيم جديدة..
- \*شكراً لتلك الوجوه المبتسمة في جبهات القتال..

المرّات القادمة لتكشف أنك لن تعثر على تلك الوجوه المبتسمة في السابق. الخوف من فقدانهم أمر صعب بالنسبة إلى شخصياً . المقاتل المبتسם دائمًا تربطك به علاقة إنسانية، ربما الخوف من فقدانه هو من أخطر الأمور التي تمرّ علىّ . وهي بالفعل أخطر من نيران أو شظايا هاون تسقط بالقرب منك.

\* كيف تنظر إلى الإعلام الكردي بعد هامش الحرية المعطاة والممارسة في السنوات الأربع الأخيرة ؟

هناك هوية للإعلام الكردي لم تكتمل ملامحه بعد . ربما التجربة ستقوم بتوضيح ملامحه في المستقبل . أهم مشوّهات هذا الإعلام هي سياسة الإعلام الحزبي . رغم كل ذلك الإعلام الكردي المسموع والمرئي أفضل بكثير من المقصود وهذا ربما يعود لسيكولوجية الإنسان الكردي كونه قد اعتاد على الاستماع أكثر من أن يقوم بفعل القراءة . وهذا ما يجعله يتغّير .

\*كلمة أخيرة زانا ؟

“سباس جبو ولات” . شكرًا لمجلة ولات . أمنى لها المزيد من النجاح . وشكراً لتلك الوجوه المبتسمة في جبهات القتال لولا هؤلاء لما استمرت في هذا المجال المتعب جداً .





## لقاء مع الصحفي زانة عمر

حوار / جوان تتر / قامشلو.



عون لي وتحمّل اندفاعي نحو العمل بشكلٍ مقبول ومُرضي.

\*الصحفي زانا عمر، دائمًاً ما تتحدث عن الصحافة الاستقصائية في الصحافة الكردية بنظرة نقدية، هل لك أن تتحدث بالتفصيل عن هذا النوع من الصحافة؟ ولمَ الانتقاد؟

نحن نعيش في مرحلة انتقالية تتسم بسقوط مفاهيم قديمة وبناء مفاهيم جديدة ، مثل الإدارة والوطنية وغيرها من المفاهيم الجديدة . كل هذا لابد أن يترافق بنشاط صحفي بجميع قوالبه وأنواعه .. الأهم من وجهة نظري هي الصحافة الاستقصائية والتحقيقات الصحافية التي تهتم بالشأن المحلي و تكشف الفساد للرأي العام ، المرحلة الجديدة المقبلة لا بد أن تبني على أساس قوية من مجتمع مدنى تراعى فيه حقوق الإنسان و الحريات العامة ، لأجل ذلك لابد من التركيز على هذا النوع من الصحافة.

\* ما هي أخطر المواقف التي مررت معك أثناء عملك في تغطية الأحداث؟ خاصة وأنك تتواجد على الدوام في المناطق المتميزة بسخونة الأحداث؟

أخطر هذه المواقف والتي تتكرر على الدوام أن تكون متواجداً في منطقةً ما و تكون هناك نيران صديقة عن طريق الخطأ . هذا أمر صعب جداً . وهذا الأمر كان في مرحلة باكرة . أمّا لاحقاً فإنه من الصعب جداً ان تعتاد عيونك على حفظ وجهه مبتسماً لتعود في

**للكاميرا** أيضاً حكايتها منذ اندلاع الثورة في سوريا، أحداث ساخنة بحاجة إلى من يرصدها في لحظتها لينقلها إلى عين الآخر طازجةً ودالةً على ما يجري ، هذا ما يفعله الصحفي (زانة عمر) مراسل VOANEWS الأمريكية، راديو والتلفزيون الرسمي الأمريكي، طوال الحرب الدائرة في المناطق الكردية (زانة عمر) لا يكتفى رصد الأحداث في المناطق الساخنة سواءً بتقارير مرئية أو مسموعة أو حتى مكتوبة في الصحف الكردية والعربية، لتعرف أكثر على ظروف العمل والصعوبات التي يتعرّض لها أثناء عمله الميداني كان مجلة (ولات) هذا اللقاء مع الصحفي (زانة عمر) :

\*الصحفي زانا عمر ما هو شعورك وأنت تتبع الأحداث الجارية على الأرض أثناء تغطيتك المستمرة للحدث؟

أشعر بالرضى كوني أعيش في هذا التوقيت من التاريخ وفي هذه البقعة الجغرافية لأشهد تغيرات قلّما تحدث عبر التاريخ وقرأنا عنها سابقاً والآن نعيشها بكل تفاصيلها الخطيرة والشديدة في آن معاً .

\* ما هي أبرز الصعوبات التي ت تعرض عملك أثناء تغطية الأخبار؟ كوني أقوم بـتغطية الأباراث في المناطق الساخنة والجبهات، لهذا أكون بعيداً نوعاً ما عن المدن، وصعوباتها، تقصر الصعوبات على جانب الخطورة من الألغام والإصابة بأضرار تلك الألغام .

سؤال شخصي كيف تتمكن من ممارسة حياتك الاجتماعية والعائلية وأنت دائمًاً بعد عنهم؟

هناك دائماً ما يدفعني للعودة إلى البيت لأنّي أعيش أوقات مع العائلة لكن ما أن أعود حتى تشدني أخبار الجبهات لأعود مسرعاً إلى مكان الحدث، هذا الأمر بالنسبة إلي شخصياً بالغ الصعوبة والعائلة لحسن الحظ هي

## Destana şehîdan

Hozanê Girkundê

li asoyên vê jiyanê  
 li ba xweda firiştînin  
 li ser sînga vê zemînê  
 azadiyê ji me re tînin  
 ewin fener û ronakin  
 tovîn evînê dicînin  
 giyanêñ xwe dikin cira  
 bo jiyanek nû vejînin  
 li ber dengê dil û hestan  
 eşqa welat dilorînin  
 ji şewla hêviyên rojê  
 lêvîn salan dikenînin  
 di mihraba şanaziyê  
 tu car serî natewînin  
 ji bêhna beybûn û gulan  
 hûn hêviyan dicivînin

## الرصاصة الخلبية

بيوار عموكا

عادي جداً....  
 أن تتزدّب  
 و أن تتمزق فوق أشواك الطريق  
 و أن تموت....  
 كل ليلة في نيران الفراش  
 عادي جداً....  
 أن تلبس الخوذة  
 و تحمل البندقية  
 و تركض وراء السراب  
 عادي جداً....  
 أن يكون لك وطننا فقدته  
 وبيتاً أضعته  
 وأسمماً لا تعرفه  
 عادي جداً....  
 أن لا تبكي  
 فالدموع حمل نفسه وغاب  
 عادي جداً....  
 أن لا تعرفها  
 فحبها مات مع أول رصاصة  
 خلبيّة  
 عادي جداً....  
 أن تصبح نحيلًا  
 في زمن بات الحصان يقود الخيال

جامع الوحدة

## » Mizgefta Qasimo «

**Ibrahim Elyûsiv.**

**Wegerandin: Mihemed zekî Mihemed.**

Xweşktirîn karemendiya heftan e  
Di şeva her înekê de  
Qehwe  
Çixare  
Mobayilê weşana asîmanî  
Jimarên bihîstokên acansên nûçeyan  
Kempîyûtera odeya pirosêsan  
Piropagendiyê her car  
Li pêşıya wê têñ  
Dirûşma nû ya ku  
Bi dil germî di darêjin  
Bi gelek zimanan:  
- Gel dixawze rêtîm birox  
Bi tevayî werdigirtin  
- Yeke yeke yeke  
Ewê wêneya zorbaz dişkand  
Bilind bûna alê bi rengên  
Xwe yên têvel  
Bi piştguhkîrina bombeyên  
Dûmanî û dengîn  
Û xaza tirsrij  
Pişt re gule  
Guleya zindî

Guleya kujer  
Pêşîrên tazî  
Wan werdigirin  
Di riya di nav bera  
Mizgefta Qasmo û  
Pira hilêliyê de  
Ku ciwantirîn limêja heftane  
Roja her înekê ye..... ■

Rêwî û qerbalixa bazara  
Himêdiyê  
Bihna wê jinê bi xwe ye  
Peyala badeyê,  
Zengilê dêrê,  
Hemî tişt di ciyê  
Xwe de amade ne  
Hindek tiştên ku  
Li gorî bejna te  
Bi lez di ber çavêñ  
Min re dibûrin  
Hêsane jê re  
Ku vegere  
Mîna berê  
Bejna te.... ■

## “Dîk elcin”

Ne pir caran diqewim e  
Ne hindek caran diqewim e  
Noleyên katjimêra te radiweste  
Tenê  
Çavdêriya te dikim  
Ji pişt cama 1988an  
Hemî tişt li ciyê xwe ne  
Çayxane  
Berdestî  
Pêpelükên  
Avahiya postexaneya nêzîk  
Ergîle  
Dûman  
Pêkenoka çarşemê ya taybet  
Dengê Melayê mizgefta  
Xalidû bin Elwlîd

## Afîrandîna cureyên bazirganiyê di vê rewşa dijwar de

**Nezîha Ebûzêd**

**L**i sûryê bazirganan tu carî bawer ne dikirin,ku wê cureyên bazirganiyê bêne guhertin bi sedema destpkirina şoreşê û guhertinênu ku di rêveçûna wê de çêbûn. Hin ji van cureyan ber bi pêşketinê çûn,bê guman hin jî ber bi xerabiyê ve çûn. Ev veguhestina diyar di bazirganiyê de bi rewşa navçeyê ye û aliyênu ku şer têde lidare girêdayî ye. Di bajarênu parêzgeha Hesekê de bi destpêka şoreşa Sûryê re cureyên nû yên bazirganiyê derketin,guhertinênu mezin di pêkhatiyêng bingeha abûrî de li navçeyê çêkirin. Bazirganen ku sûdeyê ji penaberiya mirovan bo dewletêng orpayê û derveyî welêt dîkin,penaberiya ku ji beriya 4 salan ta roja iro berdewam e. Bazirganiya firotina pêkhatiyêng xaniyan yên ku hatine bikaranîn,beriya şoreşa sûryê tinebû,tenê ew pêdiviyêng malan dihatin firotin ji bo vekirina malek nû.

Mihemed (30) salîyejibajarê Qamişloyê,bazirganê pêdiviyêng malan yên ku hatine bikaranîn,dibêje: Welatiyênu ku dixwazin penaberî dewletêng din bibin hemû pêkhatiyêng malen xwe difroşin,em ji wan dikirin û em bi buhayeke nizimtir difroşin welatiyan. Bilind bûna buhayê wan li sûkê dibe sedema ku hemû xelk pêdiviyâng ji min bikirin. Çavdêrêng vê bazirganiyê dibêjin ku ev cureya bazirganiyê di salêng dawî de û bi taybet piştî penaberiyâng xelkê ya ku roj bi roj pirtir dibe,belav dibe. Henaa Hisênu jineke ji bajarê Qamişlo,dest bi firotina pêdiviyêng mala xwe kiriye û dibêje: 2 xorten min ber bi Almanya ve çûne û ji ber rewşa bajar ya ne diyar,ez jî xwe amade dikim bi doza çûna Almanya ji bo bidestxistina jiyanek başdır. Pereyênu ku ez bi firotina pêdiviyêng mala xwe bi dest bixim,dê alîkariya min bikin da ku ez bighêjim lawên xwe li Almanya. Ji bilî vê yekê,piştî çûna min idî Hewcedariya min bi mala min namîne,pêwîste ku ez amadekariyê ji xwe re bikim û pêdiviyêng mala xwe bi erzanî bifroşim.

Penaberiyâng xelkêng parêzgeha Hesekê berdewame û bazirganî weke hemû caran di hemû rewşan de sudeyê ji taybemendiya rewş û demê dike.

Bazirganen ku vî karî dîkin dibêjin ku ev pêdiviyêng xaniyan yên ku hatine bikaranîn ji yên nû baştirin û erzantirin.Ji me re karekî pir xweşe û em sûdeyeke mezin jê dibînin. ■



## Rewşa avadaniyê li bajarê Amûdê

Mihemed Alûcî

**B**ajarê Amûdê tê naskirin, ku ew ji kevnetirîn bajarên rojavayî Kurdistan e,lê tevî wilo ev bajar ji aliyê avadaniyê ve pir paşketî ye,jêrxaneya wî ya bingehîn pir lawaz e.

Bajarê Amûdê ,ji alî hikûmetên yek pê bi pê yên Sûryê ve hatibû feremoşkirin,ji aliyê xizmetguzarî û avadankirinê ve,ev yek jî ji ber helwestên xelkên vî bajarî ku serê xwe ji tu kesî re ne çimandin e. lê tevî van hemî astengiyan,vî bajarî hêdî hêdî geşe bi xwe ve dît,hin projeyên biçük têde destpêkirin,bajar mezin û fireh tir bû,lê ev yek jî ne li gor xwesteka rêtîmê hat,di sala 2005 an de û bi fermaneke komarî benda 49an,îdî kirîn û firotina xanî û zeviyan li bajarên kurdî hate qedexekirin.

Bi vê yekê tevgera avadankirinê jî pûç bû,hemû proje hatin rawestandin.Ev ferman ji alî rêtîmê ve wek tolhildanekê bû ji serhildana 12ê avdarê sala2004 an ku têde xelkên Amûdê peykerê diktatorê mezin Hafiz Elassad rûxandin,ev bûyer yekem car di dîroka Sûryê de li ser destê xelkên Amûdê rûda.

Lê bi despêka şoreşa Sûryê,dîsa bi fermaneke komarî ferma 49an hate betalkirin,pêre jî dîsa tevgera avadaniyê li bajarê Amûdê destpêkir,û çend proje û balexane li bajêr hatin dîtin,xelkên Amûdê careke din dest bi avakirina bajarê xwe kirin.

Lê bi berdewambûna şoreşê re,ketna wê di qunaxa çekdarî de,û dirêjbûna temenê qeyrana welat,dîsa tevgera avadaniyê lawaz bû.

Sedemên vê lawaziyê li gor hin belênderên divî warî de kar dikin evin:

1-nebûna keresteyên avakirinê ji ber dorpêça abûrî li ser herêmên kurdî ji alî komên tundrew,rêtîm,û dewletên hevsê ve,îdî gelek pêdivyên bazaran nema peyda dibin,eğer peyda bibin jî,wê nirxên wan pir giran be. 2-kembûna pale û karkeran;ji ber xirabûna



11

rewşa abûrî,û ne aramiya ewlehî,gelek xelkê bajêr penaber

bûn,rêtîyeke mezin ji wan karker bûn,lewra peyda kirina karkeran îro astege .

3- kembûna daxwazan li ser kirîn û firotina xaniyan ji ber necêgîrbûna rewşa ewlehî,û buhabûna nirxê xaniyan îdî daxwaz li ser kirîna wan kêm bûye yan jî rawestiya ye.

Lê tevî van hemû astengiyan,tevgereke şermok ji avadaniyê li bajêr tê dîtin û çend werşeyên kar li vî alî û wî alî bajar têne dîtin,û xelk bi hêvîne ku rewş baş bibe û penaber û sermayedarên bajêr yên li derve vegerin û projeyên mezin lê durist bikin. ■

## الوضع التدريسي وآفاق الحل

### أفيينا دل

كانت كتبهم ناقصة حتى نهاية العام الدراسي وأيضاً طرحت مشكلة توفير السكن للمدرسين بسبب قلة رواتبهم الذي لا يسد احتياجاتهم و انهم لم يستلموا أشهر، الأمر الذي أدى إلى قيام المعلمين بالاضراب عن التدريس في الفترة الأخيرة من أيام المدرسة، فبعض المدرسين لم يستلموا رواتبهم منذ أكثر من ستة وهم أصحاب عائلات ويسكنون في بيوت للآجار، فمن بين سيدفعون إجرة البيت ومن أين سيلبون إحتياجات عائلتهم وهو لم يستلموا رواتبهم؟ كما وان بعض المدرسين تم توقيع عقود عملهم للتدرис في السنة القادمة والبعض الآخر لا يعلم ماذا سيحل بحاله، فهل ستحل هذه المشاكل في السنة القادمة؟ نأمل ذلك من منظمة IRC.

**في** محاولة منها لمعالجة وضع المدارس والطلاب والكادر التدريسي وايجاد الحلول للمشاكل التي تعرّض طريق العملية التربوية وتأمين المناخ الملائم للتلמיד والمعلمين متابعة التحصيل العلمي بشكله السليم.

قامت منظمة IRC بتنظيم عدة اجتماعات للمعلمين وأولياء الأمور لحل المشاكل التي تحدث في المدارس، فطرحوا مشاكل الطلاب معاناتهم في المدارس، فبعض المدارس لا يوجد فيها ماء للشرب فالطلاب يعطشون كثيراً لحين عودتهم الى منازلهم بعد انتهاء الدوام الرسمى، والمرافق الصحية تكون قذرة جداً لعدم توفر الماء ومواد التنظيف ولا حتى مستخدم يقوم بتنظيفها، فتنتشر الروائح الكريهة مما يؤدي إلى إصابة الطلاب بالأمراض ونهاية تسرب المياه بعض الصفوف إليها المياه في فصل الشتاء، لذا تكون باردة جداً ونتيجة انقطاع الكهرباء لساعات طويلة وعدم تشغيل مكيفات التدفئة الكهربائية ولاحتى مدافئ النفط والعدي من الصفوف تكون الانارة فيها ضعيفة والتهدوية قليلة فيكون الصف رطب دائماً ورائحته كريهة، كما وتحذّوا توحيد اللباس المدرسي وعدم توفر الكتب والمستلزمات المدرسية الضرورية، فبعض الطلاب



## Dirbêsiyê bi geşpêdana avakirinê geşbîn e.

Hûsên Al Sîno

**T**evî rewşa aborî ya dijwar û rewşa welat bi giştî û rewşa kurdistana sûrî bi taybetî di dema şoreşê de.

Ev rewş hemberî avakirinê li bajarê dirbêsiyê nebûye asteng, ya ku roj bi roj geş û xurt dibe. Dema niha em dikarin wê bi dirbêsiya nûjen bi navbikin, bi taybetî piştî binpêkirina benda 49an ya sala 2008 an, ku jiyana aborî di herêmên kurdî bi nehiştina kirîn û firotinê di herêmên kurdî de (kurdistana sûrî) pûç kir, çimkî deshilat bi saya wê bendê hemî herêmên sînorî tevî dûriya wan ji sînor ketin bin bandora wê benda kirêt.

Weke encam ji bilindbûna pileya bêkaran û rûdana belengaziyê, pişt re zêdebûna koçberiyê ji parêzgeha Hesekê ber bi paytextê ve, paşê bi ewropa de.

Rewş ji hemî aliyan ve, bi saya şoreşa sûrî ya pîroz hate guhertin, nemaze avakirin. Niha li bajarê dirbêsiyê avakirina malan û burcên heşt qat, weke yekemîn piroje li ser asta kurdistana sûrî yên ku mol û xwaringeh û kafitîriya û otêl û ofîs û gerac û qebû bo bazarê têde hene, nêzî



xeta sinorî (bin xetê) li kêleka dergehê sinorî yê bajêr û li ser xwetê 3 kolanên bingehîn bo (Hesekê-Serêkaniyê-Amûdê) di heman demê de li ser xeta dirbêsiyê-amûdê xwaringeh û sobageh bo bikaranînê amadene.

Weke pilan jî xewndinek bo avakirina gundekî nêzî bajêr mîna avahiyê bo xelkê bajêr li ser riya Hesekê yan jî li ser riya Amûdê ya ku ji 3 qatan pêktên.

Em dikarin nirxên hin alavên avakirnê bidin xwiya kirin: Bilokê (12) bi 45 L.S, Bilokê (15) bi 55 L.S, Hesin (1 ton) bi 160,000 L.S, konkirît (kîsek) bi 1400 L.S, qûm (1m³) bi 3700 L.S, Sîramîk (1m) bi 1400 L.S, cebale (1m³) bi 600 L.S, têl bi 250 L.S, Necar (1m²) bi 70,000 L.S - Xebatkar bi 800L.S/ rojek, Hoste bi 2300L.S.

Di dawî de mîna van projeyan li bajarê dirbêsiyê di Karin bi dehan kar ji bo hawilatiyan bafirîne û bibin sedem di kêmkirina kocberiyê bo dervî welêt tevî zehmetiyên ku kurdistana sûrî tê re derbas dibe. ■

13





## Qeyrana sûtemeniyê meha rojiyê li Efrînê tevîzand

Bahoz Xelîl

14

**B**erîhatina meha Remezanê ya pîroz bi hefteyekê qeyrana sûtemeniyê li Efrînê destpêkir, ango hino hino bûjenên sûtandinê ji bazaran kêm dibû, û bi destpêkirina meha rojiyê re qeyran kûrtir bû, evî tiştî bandreke neyêni li derûna xelkên deverê kir û hêşt şahiya peşwaziya biçelmise, ji ber ku di bin siya tunebûna mazot, benzîn û gaze elektirîk hate birîn ango jiyana xelkê û hemî dezgehêن xizmetguzariyê palpişt li ser vê bûjenê dikir, û wek tê zanîn ji bêtirî du salan elektirîka dewletê nîne û hatiye birîn, lewma vê yekê hêşt ku bare xelkê hîn girantir bibe...

Emîne pîrefjineke û li bajarê Efrînê dijî, weha ji me re li ser astegiyêن jiyana xwe axivî" Ev kesên ku niha sûtemeniyê li ser me qutdikin Xwedê nas nakin, ji ber heger wan xweda nasbikira wan di vê meha pîroz de sûtemenî li ser Efrînê qut nedikirin"

Xaltîka Emîne pê de diçe û dibêje" Van Xwedê nenasan em vegerandin dîroka kevnar, ji ber qutbûna elektirîkê em li ber fûsikan rûdinin, kincêن xwe li ser destan dişon û şîvîn me li derveyî dolaban tirşdibin û ne têن xwarin tevî

ku buhayê hazirkirina şîvan li ser me pir buha disekine"

Tê buhayê litra mazotê li Efrîn û herweha li deverên gundewarê Heleb û Idlibê bi giştî 400 L.S derbas kir û bi xwe re nirxên hemî pertalan û bûjenên bingehîn bibin agir û bi berîka xelkên perişan û rîncber keve! Anglo buayê tûrênen ji 75 hilkişî 120 lîreyen Sûri û nirxê kîlok sekir gîhîst 200 lîreyan û cereyên gazê bi 7000 û li şarşîyan têن firotan.

Herweha evê qeyranê hêşt ku tevgera tîrafîkê gelek qels bibe û gelekan erebeyên xwe li pêş deriyan girêdan.

Evdô ciwanek e, li bajarokê Reco radibe û rûdine, her roj mecbûr e ku were bajarê Efrîn da karê xwe yê terzîtiyê bike weha ji me re cefakêsiya xwe anî zimên" Ez neçarim ji heftê şes rojan werim Efrînê ji ber ku karê min li vir e, berê her bînekekî 100 L.S dida û di dema niha de kirê ya hatûcûnê bûye 250 L.S, ev kompere li ser min gelekî giran e, ji ber ez malbata xwe bi vî karî xwedî dikim, û heger rewş weha berdewamke ezê nikaribim karê xwe berdewam bikim"

Hêjâyî gotinê kirîza sûtemeniyê ne tenê xelkên bajêr kirîye lê herweha kesên cotkar, gundi û xwediyyêن zeviyêن fêkî û sebzeyan ji ber vê yeka ha dinalin, ji ber ku ew nikarin ji ber buhabûn mazotê motorê kişandina avê bişuxîfîn û zeviyêن xwe avdin, û piraniya zeviyêن avî di bin metîrsiyê de ne .



## Pêdîviya Vekirina Dibistanan bi Kadroyekî Wanedanî Heye.

### Şêrîn Temo

**P**işti serkeftina mezin a lehengên Kobaniyê, li dijî rêxistina DAIŞê, û rizgarkirina hemû axa Kobaniyê, şeniyêن Kobaniyê dest bi vegerandina jiyanê bo bajarê xwe kirin, û yek ji giringtirîn kertên pêwîst di vî warî de, kerta fêrkirinê ye.

Heger em hinekî bi paş de vegerin, vegerin dema berî êrîşa çeteyên DAIŞ li ser bajarê Kobaniyê, emê bibînin ku ji wê demê de -ji ber şerê ku hîn li welêt sar nebûye-piraniya xwendeyêن bajarê Kobaniyê dest bi koçberkirina ji bajarê xwe kiribûn, û niha jî û ji bo vegerandina jiyanê li wî bajari, kadroyê fêrkirinê, yek ji giringtirîn wizeyêن pêwîst e. û nabe ku jiyan li bajêr, ji ber koçberbûna ew xwendeyêن ku ji ber şer û kêmboûna derfetên kar, koçberî, raweste, ji ber vê xwedan bawernameyê di Desteya Perwerdeyê de li kantona Kobaniyê biryar dan ku peymangeheke a m a d e k i r i n a mamosteyan vekin, hem jîxoleke amadebaşikirina perwerdeyî ji bo derçûna mamosteyan, ji bo vekirina dibistananê bajêr û fêrkirinê şagirtan, da ku riya wan bi xwendinê ronî bibe, û ji bo ku tarîtya xwendinnezanîyê pê li axa bajarê wan yê serbilind neke.

Û ji bo ku derfetê bidin herkesê ku dil dike ku xwendina xwe temam bike, 2 bargeh li Kobaniyê hatin vekirin, bargeha yekem ji bo xoleke a m a d e b a ş k i r i n a perwerdeyî ye, di vê xolê de, herkesê ku bawername ji zanîngehêن bi dest xistî tê qebûlkirin, û hem jî şagirtê zanîngehan ên di sala xwendinê sisîyan û çaran de têne qebûlkirin, û herwuha herkesê ku bawernameya Bakloriya bi dest xistî û xebata wî di warê fêrkirinê de ji 500 rojî ne kêmtrir be, tê qebûlkirin. Di vê xolê de, zimanê Kurdî (hemû aste), û dîrok û xaknîgariya Kurdistanê, û Rêberkirina Derûnî Perwerdeyî, û Zanînîna (tendirustî û jîngeh), û çalakî û Waneyên Cêbecêkirinî (wek Wênekêşana Serbest) têne wanedan, herwuha seretayêن giştî yên Matmatîkê û bingeh û seretayêن zimanê Erebî têne wanedan. Hejmara şagirtê tomarkirî di vê xolê de 289 in, û 17 mamosteyêن pispor. Ev xola dê 3ê mehan dirêj bike.

Yasir Beyro (yek ji birêvebirêن xola amadebaşikirina mamosteyan e) dibêje: "armanc ji vê xolê, temamkirina hizre ye li nik mamosteyan, cunkî kesê ku bawername ji zanîngehê



bi dest xistî, zanîna wî di zimanê Kurdî de lawaz e, û paşê, piraniya şagirtên vê xolê, şeweyêن wanedanê baş nizanîn, armanc; derçûna hinek mamosteyêن jêhatî ye, û çandina kultora rêberkirina derûnî û hez ji fêrbûnê ye".

Lê hema bargeha duwem, peymangeheke amadekirina mamosteyan e. Di vê peymangehe de, herkesê ku bawernameya "Nehan" bi dest xistî û temenê wî ne kêmtrî 18e salan e, tê qebûlkirin, û herwiha kesê ku bawernameya Bakloriya bi dest xistî yan jî şagirtê zanîngehê ye (di sala xwendinê ya yek yan dudiyan de ye) di vê peymangehe de tê qebûlkirin.

Di vê peymangehe de hemû made têne wanedan, û wanene din têne bipêkirinin wek: (Gotübêja zimanê İngлизî û seretayêن compyoter), hejmara şagirtên tomarkirî di vê peymangehe de

200 şagirt e, 15 mamoste dê waneyan bidin wan e, xole di vê peymangehe 6 mehan dirêj dike, şagirtên wê piştî ku xole biqedê, dê, li pêş komîteyekê ezmûneke piraktikî ji wan re were kirin, û ew komîte dê biryara derçûna wan ji derneçûna wan bide, û şagirtê ji vê peymangehe der biçe, tevilê dest bi karê fêrkirinê li dibistanan dike.

Qet tu tişt nikare vîna kobaniyan bisikîne û riya jiyanê li pêş wan bigre, û weku wan bi lehengî çeteyên DAIŞ ji bajarê xwe der xistin, ew bi lehengî jiyanê bo bajarê xwe vedigerînin û dergehên dibistananê bajêr careke din li pêş zarokên xwe vedikin û piştî ku ew zarok ji saleke xwendinê bê par bûn, careke din ew vedigerin defter û pirtûk û pênûsên xwe, û careke din ew vedigerin sîberên zanînê, û ronahî dide hiş û bîra wan.





## Pêşbirka Zewacê

Xunav Kano

16

**P**iştî ku xort bawernameya xwe ya zanîngehê bi dest dixe, û carcaran berî bi dest bixe ji, bitaybetî heger yê mezin be, ango yê bi tenê di malê de be, mala wî jê dixwaze ku bizewice, tevlî derfetên jiyanê û yên diravî yên kêm, piştî ku ew xort du rojan an heftiyekê dirame biryarê distînê ku bizewice, ji dayika xwe dixwaze ku keçekê jê re bibîne ji bo ku pê re bizewice, piştî ku xort û keç hevdû nasdikin, û mejî û ramanên hev dinasin û bi hev qayildibin, gellek caran ji xort û keç hev nasnakin, xort ji dervî Sûryê ye, dixwaze bi keçekê weke xwe re bizewice, gellek caran xort û keç tenê di roja zemawendê de hevdû dibînin, ji ber ew xort nikare vegere, û xuşka zavê yan diya wî xelekê li bûkê dike, piraniya ahingên ku çedibin dibe ku bûk li ser kursiyekî rûdinê û kursiyê din dimîne sîberê zavê, herweha di herdû salên dawî de piraniya keçen dizewicîn ji 20 salî kêmîtir bûn, ji ber weke ku malbatên wan dibêjin ku ew ji Daişê ditirsin ji ber vê yekê keçen xwe didin zaveyekî li dervî welêt.

Ne tenê bûk bi temenekî biçûk

dizewice, ji ber ku malbatên gelek ji xortan jî dibêjin ku lawê wan li derve bi tena xwe ye ji ber wilo biryarê distînîn wî bizewcînin ji bo ku bi tena xwe nemîne,

Dibe dema xwestin û xelek û pereyan, û diyare ji gellek şopêneran re ku bihabûna tiştên pêwîst ji bo zewacê gihaye asteyeke bilind, nemaze nirxê zêr û cilan, zave jî baz dide, ji vir û wir pereyan peyda dike, ji bo xewna xwe cîbecê bike, herweha rewşa zewaca nuha-piştî qeyrana Sûriyê-hatiye guhertin, weke mînak berê bûkê gelek cûreyên zêr dikirin ji bo zemawenda xwe, nuha piraniya bûkan tenê zincîr û xelek û guharan dikirin, "Saiid Osman" xorteke bi dergîstî ye, derbarê buhanûna pêwîsiyên zewacê ji kovara Welat re dibêje:

"Em gelek zehmetiyan dikşînin ji bo zewacê, tevlî ku temenê min û yê bûkê biçûk e, lê dema min dît ku ez nema dikarim li welat bijîm, min biryar stand ku ez bizewcim, sedema dûyemîn ku ez jiyana xwe bi rêxistin bikim, lê dema min dest bi kiryara zewacê kir, ez matmayî ji buhabûna pêwîsiyên zewacê mam, nemaze qelen û zêr, û ji şensê min bû ku ezê li mala bavê xwe bizewcim, heger mala min serbixwe ba tu carî min nikarîbû nuha bizewcim".

Herweha "Osman" ji ciwanên weke xwe re got:

"di vê demê de her ciwanê temenê wî yê zewacê be gerek e bizewice, ji ber jiyan di şer de nasekine, û zewac dihêle mirov bi welatê xwe ve bê girêdan.."

Pirsgrêka gewre ne ya diravî ye, ji ber heger em bi dîrokê re vegerin paş, emê bibînin ku berya şoreşa Sûryê temenê

zewacê bibû 25 sal û jor, bi kêmanî li herêmên Kurdî, lê vê şoreşê hişt ku zewac jî weke hemû tiştên jiyanê paş de vegere, "Hindirîn Hindê" endama navenda civaka sivîl û demokrasiyê "CSD", li ser pirsgrêka zewacê li herêma Cezîrê û bandora wê li ser civakê axivî û got:

"weke çalakvanekê di qada civaka sivîl de, ez li dijî zewaca di temenê biçûk de me bi hemû cûreyên xwe, herweha ev rûdawa xwedî metirsî ya ku piştî qeyrana Sûryê belav bûye, berê jî hebû, lê nuha zêdetir bûye, sedema yekemîn ku xelk nema dizanin çawa ji zarokên xwe û perwerde û xerckirina peryan li ser wan xilas bibin, herweha di ramana keçê de ku ji yê yekemîn ku li deriyê wê dixe nezewice nema dizewice"

"Hindê" anî ziman:

"ji ber ku xwendin nuha li herêma me li ser fen û fût û raçêteyan dimeşe, malbat dibîne ku ji dêvla ku zarokên wan vê xwendinê bikin wan dizewcînin, di nerîna min de dema malbat wisâ birame ev tê wateya ku xwendin bi giştî ji wan re ne girîng e"

Pirsgrêka derbasî nava civaka Kurdî li Qamişlo û Hesekê û bajarên din yên navçeya Cezîre bûye, ew e ku keç ketine pêşbirka zewacê de, û asteya temen daketiye, ji ber di nerîna civakê de ku jin çiqasî zû bizewice ewqasî baştire, ji ber vê yekê bala piraniya keçan çûye li ser zewacê bêhtir ji tiştên din yên jiyanê, heger ev rewş berdewam bike dê metirsiyek li ser jimarek gewre ji keç û xortan çêbibe ji aliyê xwendin û derûniya wan ve, herweha wê zarok û dê û bav bi hev re mezin bibin, û ciwanên ku divê bi mejî û çalakiya xwe welat ava bikin, dê tenê jimara malbat û zarokan zêde bibe lê bê sûde... ■



## Hindek encamên Zinara Erebî ye kirêt.

Haydar Sifûk

**B**enda Zinara 'Erebî "Elhîzam El'erebî" Tirbespi û gundewarê wê weke her herêmeke kurdan ber bi sînorêن bakurî kurdistanê Turkiyê ve niha rastî benda "Elhîzam El'erebî" ve, bi zor û zordariyê hatin, ew zulma ku ji aliyê desthelata sûrî ve hat amadekirin di sala 1965 û di sala 1974an de hat bi karanîn, di benda "521" paşê bi dawîkirina "şerê Uktoberê 1973an" Tax bi temamî bûne Ereb, rîjîmê zevî bê nirx dan wan û got ji xwe re bikin mal û firoşgeh di nava bajêr de "Hey Elsewra", ji bilî ku bi hazarêن dûnimîn xaka çandiniyê ji destê kurdan derxistin û bi kederek giran sipartin van Ereban û hatin bi çekkirin da xwe ji xwedîyêن van milkan mewdanan yên ku tev de kurd bûn biparêzin. Gundêن Mexmûriyan yên ku rîjîma Sûrî ji wan re peyda kirin mezin in û pêşketî ne li gor gundêن Kurdish û gundêن wan yên ku dikevin nav gundewarê bajarê Tirbespiyê ji ev in (Tenûrî, Hilwa, Qehtaniyet, El-xemir, Mizgeft, Girdêm, okil

û Til Berhem ...) herwiha hin gundêن dî jî hene. Di dawiya navêن van gundan ve dibêjin "Elxemi" "da ji yên Kurdistan werin cuda kirin, ji ber ku her gundek ji van di kêlekê de gundekî Kurdistan ji xwezayê ve heye û wek wî navî ye. Belê! ne tenê hin şeniyêن ku dijîn ber bi bendava Feratê hatin bi mewdan kirin li herêma Tirbespiyê, lê tê zanîn ku şeniyêن bajarokê "ElSifîre" yê ku bi gundewarê parêzgeha Helebê ve girêdayî ye hatin derdorê bajêr û bûn xwedî zevî û mal weke ku niha ji wan re dibêjin "Sefarnê" yan ji "Sefranî" û hin şeniyêن gundewarê Hema yê ji dijîn nav Mexmûriyan. Berî van karê desthelatê dibêjin ku Ereb bi dizî ve dihatin bazara bajêr da ku pêdiviyêن xwe yên rojane bikirin û ev xweş şehadet e ku Tirbespi berê bajarekî Kurdî bû û dikêleka wan de xiristiyan ji hebûn, lê Ereb di vê herêmê de nebûn .. ji bilî "Elhîzam El'Erebî", Kurdêن rojavayî Kurdistan rastî gelek êrîşêن taybet hatin, weke benda 49a, kişandinaa nasnameya Sûrî ji hezarên şeniyêن kurd .. û benda 136an ku parêzgeha Hesekê kir herêmek sînorî da qet avahî tê de nebe yan ji were seknandin da xelkêن wir koçberbibin. ■



## Xweşnav Heso

## PEYVA WENDAYÎ

(hey lê gulê – gula minê  
– şêrîna – li ber – dilê  
minê – ez – gulê nadim  
– bi – malê dunê – û  
ez li ser – gulê – têm –  
kuştinê – bavê – felek ).

H	L	I	B	E	R	Z	B	I	G
E	M	A	L	ê	D	I	N	Ê	U
Y	G	K	U	Ş	T	I	N	Ê	L
L	U	B	A	V	Ê	A	G	M	A
Ê	L	F	E	L	E	K	R	Ê	M
G	Ê	O	S	Û	S	Î	P	T	I
U	Û	E	Z	L	I	S	E	R	N
L	D	I	L	Ê	M	I	N	Ê	Ê
Ê	Ş	Ê	R	Î	N	A	A	E	Z
N	G	U	L	Ê	N	A	D	I	M

Peyva wendayî ji 12 tîpa pêktê , navê du çiyayên Kurdistanê.



Bersiva jimara bûrî : Hesekê

## XAÇERÊZ

## Asoyî :

- 1-yek ji demsala ye.
- 2-yek ji jîmaran – sê tîp ji peyva Zencîr.
- 3-tersê zemîn – ji êşê re .
- 4-cih – wilo .
- 5-yê ku karê endeziyariyê dike .
- 6-îro .
- 7-berî 24 demjimêran – du tîp wek hevin-pûrt.
- 8-rojgeha Êzîdiyan .

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	Red						Dark Blue	
2			Orange		Cyan			
3						Green		
4				Dark Purple				
5								
6		Magenta					Red	
7				Brown		Purple		
8	Brown						Green	

## Serjêr

- 1-navekî lawan.
- 2-tersê zehmet – kêşeya baweriye .
- 3-gotina Merd belawela.

- 4-sê tîp ji gotina Mîlav – evîn bi Ingilîzî.
- 5-gotina Newroz belawela.
- 6-yek ji rojêñ hefteyê (b) –sê tîp ji peyva diyadora.
- 7-tersê gotina Tîr (b) .
- 8-tersê raketinê.

## Jimara bi tenê

Cihê vala di her malikê de bi jimara gerek dagre, lê divê ku tenê carekê jimar were dagrtin di her malekê de, û herweha divê ku tenê carekê were dagrtin li ser xêza asoyî û serjêr .

	9	1			2	
4			5	2	8	
	1		4			3 5
5	3	4			9	
9			1	3	4	6
6			8	9		3
3	2	6				5
9			2	1	3	7
4	8	7	3			9

Bersiva jimara bûrî

7	5	9	1	8	2	4	6	3
8	1	6	3	4	7	5	2	9
2	3	4	5	6	9	7	1	8
9	6	7	2	5	8	3	4	1
1	4	8	7	3	6	2	9	5
3	2	5	9	1	4	6	8	7
5	8	2	6	7	1	9	3	4
4	9	3	8	2	5	1	7	6
6	7	1	4	9	3	8	5	2

19

## PEND Û ŞİRETÊN KURDÎ

- 1 Gava dunya dunya bû,Gur şivanê miya bû !
- 2 Qenciyê bike û bavêje avê !
- 3 Nan ji êlê ye û av ji golê ye !
- 4 Miya biyan,li rex kerî bi tenê mexel tê !
- 5 Mêra mîr dikuştin,û Cibûrya hîrî dişuştin !
- 6 Xidiro,hero-diro li viro !
- 7 Heger ew bifire jî,tim ewê golik bimîne !
- 8 Dostê kevn nabe dijimin !
- 9 Cîranê nêzîk ji birayê dûr pêştir e !
- 10 Bextê mîra zêr e !



# Dîmenê berdewamiyê bi hin alavên kevn



welatpress2014@gmail.com  
[www.facebook.com/Dengekurdistanasurya](https://www.facebook.com/Dengekurdistanasurya)



ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (٢٣) ٢٠١٥/٨/١